

Riya Ewropa di Amedê re diçe

Enehîte Morad

Li ev çend salên dawîn, dewleta Tirk, piştî daxwaza wan ji hêla hevgirtina Ewropî ve nedihate pejirandin . Pir asteng di riya derbasbûna wan de pêk dihatin , pir merc û şîret diyarî wan dibûn , ji wan re aşkere digotin : pêwîste demiqurasî û mafên mirovan di hundir Tirkiyê de cî bigirin û doza gelê Kurd bi awakî demuqras û dadmend çareser bibe , rêzgirtina dewletên cîran nemaze dewleta Îraqê û H.W.D girîng e. Wisan jî. dewleta Tirk neçardibû, ku berê xwe bide hin guhartinan, di pir waran de gavine li pêş û şaristanî bavêje , ta ku rûyê xwe yê reş li pêş raya der û hundirbi awakî sipî bike. Belkîm di pêşerojê de, di nava hevgirtina Ewropî de cî bigre !.

vêca jî, dema mirov serlêdanekê , ji dewleta Tirk re çêdike ;Ew dîmenên şaristanî baş diyar in , heyama dewletên Ewropî bi bîra mirov tînin, ji paqyjiya kastî û cadan de bigire ta geşkirina aborî û têkliyên civakî re derbas bibe . Hemwelatî tev li ser bingeheke rêzgirtinê hatine perwerde kirin . Hema di warê bazarganî de, ma kî nizane ku dewleta Tirk pir sûkên cîranan weke Îraq ,Sûriyê , Libinan, Misir û H.W.D ji xwe re kirine bazar û xwe têde beloq vedine. Bêgûman îro navê dewleta Tirk, di nêv dewletên Rojhilata navîn de bilind û bilind têye hildan , digel wê nîrxê zimanê Tirkî her diçe bilind dibe û reng vedide, nemaze di nêv gelên Ereba de .Li vê dawiyê piştî hilweşandina rejîma dîkteror ê Îraqê Sedam , Emrîka Tirkan bi serkêşiya Receb Teyêb Erdogan dostê herî nêzîk ji xwe re dibîne.

Her diçe têkiliyên Tirkan, bi hêzên îslam û dewletên cîran weke Sûriyê û Îranê geş û xurt dibe . Vêca jî, Emerîka bi awakî dixweze , ku Tirkiye ji pêlanên Tehranê biparêze, ta ku dostaniya wan berdeyam be . Îro Tirkiyê weke xêrxaz doseya çareserkirina pîrsgirêka îsraîl,Sûriyê û

Felestîne hilgirtiye , roleke balkêş dilîze û navê dewleta Tirk di raya cîhanê de berçav dibe !. Tevî wê jî, hevgirtina Ewropî weke endam wan napeirîne , ew jî dixwezî xwe di ser doza gelê Kurd re bavêjin , an jî bi perspanan çareser bikin .

Weke çawa pir caran , wan di ragihandinên xwe de, nîşan didin ku gelê Kurd di hundir Tirkiyê de, di xêr û xweşiyê da ye, dibistan bi zimanê kurdî ava bûne ,û ji berê û paşê ve wekhevî di nêvbera gelê Tirk û Kurdan de heye. Lê, ji ber ku Kurd nezan û bê hiş in, ji ber wê jî , ji hêla hêzên derve ve weke Îsraîl û Emerîka bi hêsanî tene xopandin û alikariya kesên li dijî hêmenî û hepîvana xaka dewleta Tirk –weke mediya Tirkan dixwaze- dikin û serêşan ji me Tirkan re çêdikin , encama wê yekê rejîma Tirk neçar dibe ku êrişên xwe bibe ser herêm û gundên Kurdan!!.

Ev nêrîna di herdû zincîrên hunerî \ Têlvîzîyonî \ Tirkî de((Wadî Elizî,ab û Elerd Eltyibe de)) baş şirofe dikirin , nemaze di Wadî Elizî'ab de !? . Pir û pir pêwîste, ku em bînin zimên , ji hêla hunerî ve lehengên zincîra wadî Elizî'ab bi çoxekî pir bilind rolên xwe lîstibûn, ji rola Morad Elemdar û herdû hevriyên wî Mêmefî û Ebiddlhey ve bigire û ta di Îskender û Fêler ve derkeve !.

li dawî , bi kurte birîn hêvî û merema me, ku rejîma Tirk li xwe bizîvire û bi jîrekî doza gelê Kurd ne tenê bipejirîne û hew, lê belê, bi awakî demoqras çareser bike û lêborînê ji gelê Kurd bixwaze. Ji ber ku doza Kurd dozeke rewşa û dadmend e , tu carî bi derew û perspanan çareser nabe ne wilo?. Nemaze çareseriya doza gelê Kurd li Tirkiyê , daxwaz û berjewendiyên Tirkan bi awakî aşkere bi cî tine. Hingê em Karin bêjin ku pêlên demoqrasî li Tirkiyê û wekihevî cî digire,û riya hevgirtina Ewropî li pêş Tirkan vekirî dimîne .